



Çawa telefone alîkariya bijîşkî ya bi lez bikî

Ambûlansa NSW xizmetên acil yên tenduristî ji danîştvanên NSW re pêşkêş dike. Em alîkirina acil ya tenduristî dikin ger tu li herêmeke metropolî bî, li deverê gundî yan herêmî bî (rural or regional area). Ger bo rewşa te ya tenduristî pêwîst be, em her weha tevdêrên neqiyata bi lez dikin. Em her tiştê ji dest dihêr dikin da ku nexweş miqayitiya durist di dema guncav de, li şûna guncav bi dest xe.

Daxwaza Alîkariyê

Rewşên awarte yên bijîşkî pêwîstî bi baldariyê lezgîn hene. Mînakên rewşên awarte wek van in:

- jixweçûna nişkavî (ketina ji nişka ve)
- jana sîng (êşa sepetê)
- tengbûna nefesê
- tezîna nişkavî yan pûçbûna rû, pî yan çaqê
- hestiyên derizî (şkestî)
- xwînhatina bêkontrol
- haletên din yên ceddîye pîjîşkî
- qezayên otomobîlan

Gellekî girîng e mirov bizanibe çawa daxwaza alîkariyê bike ger kesek bi giranî birîndar bûbe yan hewcedarê alîkariya pîjîşkî ya bi lez be. Dema lezgîniyê pîjîşkî, baştir e telefone sê caran sifir (000) bikî, Îngliziya te baş be yan na. Xizmeta sê caran sifir (000) rojê 24 sa'etan, heftêyê 7 rojan heye û her dem belaş e.

Kesên kerr û kêr dibîsin dikarin bi rêya National Relay Service telefone sê caran sifir (000) bikin, yan bi TTY ya xwe ji jimara 106 re lêxin.

Pêdiviya me dê bi çi agahiyên hebe

Kesa/-ê li ser xeta sê caran sifir (000) dê bipirse ka tu hewcedarê 'Polîs' (Police), 'Agir' (Fire) yan 'Ambûlansê' (Ambulance) yî. Dema 'Ambûlansê' bixwazî, tu dê bi Navenda Kontrola Ambûlansa NSW re werî girêdan. Ger kesê li ser telefonê fêhmkirina te dijwar bibîne, heye ku bipirse ka dixwazî bi çi zimanî bi axaftî û tevdêra dîtina wergêrê telefonî bike bo hêskirina dan-û-stendinê.

Kesê li ser telefonê dê hinek pirsên stander bipirse da ku bo amadekirina xizmeta herî guncav bi zûtirîn dem bi me re alîgir bin. Evên li jêr hinek ji pirsan in:

- Navnîşana durist ya rewşa awarte çi ye?
- Jimara telefona tu jê telefon dikîye çi ye?
- Kêşe çi ye, min baş agahdar bike ka çi bûye?
- Nexweş çend salî ye?
- Nexweş hişyar e?
- Nexweş nefeskêş e?

Girîng e aram bimîni û agahiyên zelal bidî.



Dû re çî dibe?

Telefonê megire. Li ser xetê bimîne bo bêtir talîmat.

Kesê li ser telefonê heye ku pirsên din bipirse û dikare li gor rewşa awarte her weha bêtir alîkarî û pêşniyaziyên bijîşkî bi telefonê bide.

Ger te birîneke yan nexweşiyêke bo jiyana te tehlûke hebe, karmendên tenduristî dê tavilê werin şandin.

Ger te brîneke yan nexweşiyêke bo jiyana te tehlûkedar nebe, lê pêdiviya te bi alîkariya bijîşkî hebe, karmendên tenduristî dê di dema bo rewşa te guncav de werin şandin.

Ger ne hewcedarê alîkariya bijîşkî ya li cîh bî, heye ku telefonkirina te hewaleye nêrsekê/-î qeydkirî bibe (hemşîre), ew ê bikaribe li ser tîlefônê şîretan bide te û berdêleke xizmeta pijîşkî pêşniyaz bike.

Dema li benda gihîştina ambûlansekê bî

- Miqayit be ku bo gihîştina mala te rêyeke vekirî heye. Dibe ku ji bo vê yekê livandina tiştên wek otomobîlan, kûpikên mitan û mobîlyayê pêwîst be. Heye ku hewceya karmendên tenduristî bi birina nexweşraker yan hacetan bo şûna nexweş lê hebe.
- Heywanên malê têxe cîhekî derîgirtî
- Kinc û tiştên pakîyê ku pêdiviya nexweş dikare pê hebe têxe çenteyekî biçûk.
- Miqayit be te van agahîyan bo karmendên tenduristî amade kirine: rekorda tenduristî ya kesê/-a nexweş, dermanên berdewam, hesasiyeten kesê/-a nexweş û hacetên taybet.
- Ji bîr meke hemî kartên pêwîst yê teqawîte yan tenduristîyê, lîsteya jimarên telefonên xizim û dosatan, û kilîten mala xwe bi xwe re wîni.
- Bila kesek binihêre ku hemî derî û pencere girtî ne, û alavên elektirîgî yê ne pêwîst wek sobeyan vemirîne.

Şîretên grîng

- Bi bîr wîne ku ambûlans ji bo parastina jiyana kesên in û ne taksî ne. Xwaztina ambûlansekê bo rewşên ne lezgin (non-urgent) dikare bibe sedema mirina kesekî.
- Grîng e zarok û mêvanên ji derveyê welêt bihên fêrkirin ku jimara awarte li Australya sê caran sifir e (000), her weha agahdarkirina wan derheqê navnîşan û jimara telefona te de.
- Heke ji xaniyekî, apartmanekê yan ji navnîşana karsaziyekê telefon dikîye, miqayit be ku jimara şûnê ji kolanê baş xuya ye.
- Ger li şûnekê bî ku dîtina xwe dijwar e, bila kesek li derveyê avahîyê/şûnê bendewar be da ku îşarete ambûlansê bike, yan çiraya pêş malê bi şev vexistî bihêle.
- Ger li deverêke gundî bî yan li şûneke ku dîtina xwe dijwar e, şanên li wir hene bi bîr wîne, wek 'xaniyê zer bi hewşa çitî' (textî), bo nimûne.
- Bikarhênerên rê divêt rê bidin ambûlansan. Bi dîtina tîrêjen çirayên ambûlansê yan bihîstina dengê tûtika wê re, divêt rê bidî derbasbûna ambûlansê. Metirse û qanûnên trafikê bînpê meke. Ya adetî ew e ku mirov bi miqayitî bilive aliyê çepê.

Bo bêtir agahdarî derbarê çawa-xwaztina alîkariya pijîşkî ya bi lez de, ji kerema xwe biçe malpera Ambûlansa NSW:
www.ambulance.nsw.gov.au



NSW Ambulance

excellence in care